



Kurdi Bi Elfabêya Latîni

APÊ KAL



Xortek rojekê bi rêborî li serê çiyayekî derbas dibe. Dibîne ku apekî kal bi tevir û bêrê bi serê wî çiyayî ketiye dikole. Xort diçe balê, lê silav dike. Ap ji silava wî vedigire û xêrhatinî didê. Li hal û wextê hev dipirsin. Wê gavê xort ji apê kal dipirse:

- Apo te xêr e tu bi tevr û bêrê bi serê vî çiyayê mezin ketî dikolî?

Apê kal:

- Birazî, li ber vî çiyayî zeviyeke min a mezin û xweşik heye. Ez ji zeviya xwe pir hez dikim. Her sal wê dikolim û diçînim. Lê ev çiyayê bilind sî dike ser zeviya min. Nahêle ku çandiniyeke pak çêbe.

E
C
D
M
R
M
W
C
A
S
K
Y
N
B
V
Y
Q
F
Z
U
I



Ez bi vî çiyayî re ketime belayê. Min soz û peyman da xwe ku ez vî çiyayî bikolim û nizm bikim, dema roj hilbê tav bide zeviya min. da ku çandiniyeke baş li zeviya min çêbe.

Xort ji vê gotinê ecêpmayî dimîne, paşî dibêje:

- Apê delal emrê te boriye, tu dê vî çiyayê mezin çî qas bi tevir û bêrê bikolî? Heta ku nizm bibe û tav bide ser zeviya te heylo. Were dev jê berde ez te bibim mala te. Tu guneh î.

Apê kal bala xwe dide xortê ciwan ku jê fêhm nake. Kalo bi baweriyeke mezin û bi hesreteke kûr jê re dibêje:

- Xortê delal!

Hinek ez bikolim.

Hinek kurê min.

Hinek jî neviyê min.

Ew ê rojekê tav bide zeviya min!...



ferhengok

Xortek: gencek

Ap: mam

Kal: pîr

Birazî: biraza

Sî: sîber

çî qas: çend

dev jê berde: bihêle

hinek: hindek

tav: hetav

E
C
D
M
R
W
C
A
S
K
Y
N
B
V
Y
Q
F
Z
U
I